MIHEMED NÛRÎ
(ETRÎ GILOLLANÎ)
(1927-19.01.2009)

Mihemed Nûrî li Kurdistana Rojhilat li Gilollana Xwarê li devera Gewurka ya ser bi Mehabadê li sala 1927 an de ji dayika xwe bûye. Li cem bavê xwe û geleien wê navçê wendina xwe pêş de birye. Di xortaniya xwe de di nav şervanên azadiya Kurdistanê de ciyê digire. Ewqas sal peşmergetî û siyasetmedariyê de emrê xwe yê 82 salan diborîne. Li roja 19.01.2009 an de, ew pêşmergeyê Komara Kurdistana Mehabadê, kesayetî û helbestvanê welatparêz Mihemed Nûrî piştî mudetek nexweşiyê de li bajarê Bokanê koça dawiyê kir. Li gundê "Girdî Qebran" de hate binax kirin. Mihemed Nûrî hevbîrê Pêşewa Qazî Mihamed, dostê helbestvanên navdar yê Hejar, Hêmin, Awat û Heqîqî bûye. Ew di sala 1943-1944 an de bûye endamê J.K. „Komeley Jiyandinewey Kurdistan" û endamê Hizba Demokrata ya Kurdistanê serdemê Qazî Mihemed bû. Komelê de naznavê xwe "Etrî Gilollanî" wergirtiye.
Di wê demê de Mihemed Nûrî di nav helbestvanên serhildan û raperîna Kurdistanê de, ew jî mîna Hejar, Hêmin, Awat û Heqîqî dihat nasîn.
Lê ew salên dawî de helbestvanê gewre bi jiyanek awerte, di nav bêdengiyê de dijiya. Ew xwediyê çend dîwanên helbestan e. Çi mixabin helbestên xwe di nav gel de baş nehatine çap kirin û belav kirin. Wî gelek gotarên xwe di Kovara Sirwe, Mehabad û çendîn govar û rojnameyên dîn yên Kurdistana Îraqê de weşandine. Mihemed Nûrî di dema hukumeta monarkîstî ya Îranê de, di Parlimanê de qasî demekê, parlmênterê bajarê Bokanê bûye.
Mihemed Nûrî bi Kurdiya Rojhilat ya Kurdistanê bi zaravayê Soranî gotar û helbestên xwe nivîsîne. Di sala 2006 an de cara yekemîn helbestên wî weke pirtûk li aliyê Binkey Jînê li Silêmaniyê li Kurdistana Iraqê bi navê " Şewêk û Xewnêk Bistûy Jiyan" hatiye çap kirin. Helbesta " Le ser Bistûy Jiyan" yek ji nimûneyên hêja ya helbestên Kurdî ye. Ji bêyî helbestan bi şehadeta nivîsên wî di "Şewêk û Xewnêk " de mamoste pexşana şêwezara Kurdiya Navîne jî, di pirtûkê de bêyî helbestan, serpêhatiyên xwe jî, têda nivîsandine.
Ew di helbesteka xwe ya li ser Komara Kurdistanê Ya Mehabadê û li ser Pêşewa Qazî Mihemed ya ku di wî serdemî de, di rojanmeya „Gowarî Kurdistan"ê de belav kirî de Mihemed Nûrî wusa dibêje:

Rojî bedbextî xilas bû, bextî (ême) hatewe,
Tîşkî serbestî wederxist hate şax û zerdewe!..

YA WETEN YA MIRDIN

Barî estoy dujmine wa hêsî kirdo gerdinim
Namewê ew jîne talle ya weten ya mirdinim

Ey weten lew wextewe em roleyet xistote rro
Şîrî to kewtote yad u mêhrî toy girtote xo
Dil be sazî to be keyfe rû be xoşî rûyî to
Pêm gutî : debme bellagerdanî to bê hîç diro
Wextî îcray qewlime obal be textî gerdinim
Namewê ew jîne talle ya weten ya mirdinim
.....
.....
Ey weten ger jîn hebê, heqqe ke to jînî minî
Namewê seyrî gullistan to ke perjînî minî
Awrim bo hêzî dujmin çunke to tînî minî
Qîbilekem, îmanekem, peymanekem, dînî minî
Ger butî zîninar ebestim bibye xaçî gerdinim
Namewê ew jîne talle ya weten ya mirdinim

(Le jimarey 3-î Gowarî Kurdistan le salî 1946 an
da çapkirawe. Ew şê're le kobûnewekanî
Komeley Jiyanî Kurd „J.K.“ da xwêndrawetewe)